# BUROYA KURDÎ

# ya Pêwendî û Agahdariyê

**Bultena agahdariyê N° 87 - Tîrmeh 2012**
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tel. 02 219 80 60 www.kurdishbureau.be
kurdishbureau@scarlet.


www.arsivakurdi.org

## XEBATA BUROYA KURDÎ

### *HEZÎRAN 2012*

**KONFÊRANS**

***24.06.2012 : Ewropa û diyardeya koçberiyê (dûmahîk): Ji sedsala 11mîn heta 15mîn***



Marine Imberechts, dîrokzan û antropolog, birêvebira bernameyan a Navenda Çandî ya Ewropî, rêxistineke navneteweyî ku ji aliyê UNESCO hatiye nas kirin, kurteya beşa 3mîn a pirtûka xwe ya bi sernivîsa "Koçberî li Ewropa ji berê dîrokê heta rojên me" kir.

Vê carê, ew li ser koçbûnên li Ewropa ji sedsala 11mîn heta 15mîn peyivî :

***Sê nîşankên (têbînî) pêşîn :***

1. "Têrrorên sala 1000" : Çend sal berê sala 1000, civaka çaxên navîn têrroreke hema efsanewî (mytologique) jiya. Wê bi hebûna hovekî (wahş, dragon) ku 1000 sal xwe li bin erd veşarti bû û ku amade bû ku di sala 1000 de derkeve bawer dikir.

2. Baldan :

   a) Qelsbûna hukmê "carolingien", ango yê imperator Charlemagne et zarokên wî, sînorên imperatoriyê ji gelek dagîrkirinan (işgal) re, nemaze yên Ereb "Sarrasins", Hongarî, Normandiyan … re vekirin.

   b) Di vê tevliheviya giştî de, çîneke civakî ya nuh çêbû : Ya fêodalên mezzin, ku bi xwe re perçebûneke gelek mezzin a axê û ya netewahiyan anî. Her ku diçû, parastina gelan dihat dayîn xwediyên erd ên gelek mezzin. Fêodalîsm bû diyardeyeke (fênomên) taxî (mahallî, nêzîk) ya hem damezrana berhamanînê (production) û hem xweparastinê.

Nîşank : Fêodalîsm li Imperatoriya Rojhilatî (Ortodoks, a Bysance), ku tê de yekîtiya ziman û olê (dîn) hati bû parastin, nîn bû.

   c) Hewayê pirr xerab ji sedsala 5mîn heta 10mîn xerabûna rewşa wê demê zêde kir : sermayên mezzin, nexweşiyên cihê, birçîbûn, şerr …

***Ji sedsala 11mîn de, guhertinên mezzin hêdî hêdî dibin :***

- Baştirbûna hewa.
- Ev baştirbûn pêşveçûna gundan anî :
  - Pêşveçûna têknîkên çandinî.
  - Lênêrîna berhemanîneke (production) çandinî ya dewlemendtir.
  - Lênêrîna bilindbûna dêmografîk (pirbûna xelk) û baştirbûna rewşa gundiyan.

- Pirbûna xelk guherandina ciyên wî anî. Weka nimûne : Alman çûn Polonya.

- Nîv-koletî ajot (dewam kir) û bitenê di sedsala 15mîn de hunda bû (li Ewropa Rojhilatî ew gelek derengtir hunda bû).

- Li Rojava hunera dest (artisanat) û bazarganî pêş de çû û ji nuh de avabûna bajaran anî. Lê cihêtiyek (ferq) di navbera hunera dest a gundan de, ku ji aliyê fêodalan dihat çavdêrî (kontrol) kirin, û ya bajaran (tiştên luks) hebû.

- Pêşveçûna mezzin a bazarganiya navneteweyî di sedsala 11mîn de, bi riyên erdî û deryayî û hogiriya şerrên xaçparêzî di navbera sedsalên 11mîn û 15mîn de.

- Cîguherandinên bazarganên mezzin.

- Gerrên hergav dûrtir ên maceraciyên (aventuriers) mezzin, weka li kêlekên deryayan ên afrîkî (Marco Polo …).

- Hatina Tirkan ji çiyayên Qefqasya û êrîşên Mongolan ber bi Polonya, û piştre yên Osmaniyên ku Mongol şikandin.

**HEVPEYVÎN**

***20.06.2012 :*** Carmeline Godfirnon, xwendekareke sala dawîn a beşa civakzaniyê (sociologie) li zanîngeha Liège, ji bo amadekirina têza xwe ya lîsansê (master) li ser pirsa kurdî hevpeyvînek (interview) bi seroka Buroya Kurdî, Pervîn Cemîl, re kir. Pirsên ku wê jê pirsîn li ser rewşa çar perçeyên Kurdistanê, revenda (diaspora) kurdî li Ewropa û Beljîka û li ser xebata Buroya Kurdî bûn.

# NÛÇE JI KURDISTANÊ

## *HEZÎRAN 2012*

## KURDISTANA TIRKIYÊ

### JI 10 SALAN DE 171 ZAROK HATIN KUŞTIN

***Di 04 Hezîran 2012 de***, bi hinceta Roja Navneteweyî ya Zarok, Rêxistina Mafên Mirov li Tirkiyê (IHD) daxuyand (îlan kir) ku ji 2002 de, sala ku partiya AKPê hat desthilatê (hukm), 171 zarok di pevçûnên bi polîs re jiyana xwe hunda kir. Ji 24 salan de, ango ji 1988 de, 552 zarok ji heman (eynî) sedeman (sebeb) mirin. *(rudaw.net, 04.06.2012)*

### PKK 16 KESAN AZAD DIKE

***Di 04 Hezîran 2012 de***, çekdarên PKKê (HPG : Hêzên Parastina Gel) daxuyand ku wan di Gulan 2012 de 31 kes ragirti bûn û ku ji wan 16 hatin azad kirin.

Wezîrê tirk ê hundir, Idris Naim Şahin, daxuyand ku di salekê de, ji Hezîran 2011 de, PKKê 85 kes revandin û ji wan 75 azad kirin. Ji aliyê xwe, HPG daxuyand ku di Gulan 2012 de, di pevçûnên bi leşkerê tirkî de, 105 serbaz (esker) hatin kuştin û 63 birîndar kirin. Ji aliyê HPGê 24 çekdar mirin. *(rudaw.net, 05 û 06.06.2012)*

### 532 JINÊN PARÊZER LI KURDISTANÊ



Li 11 bajarên Kurdistanê 532 jinên parêzer (avukat) hene : Diyarbekir 184, Batman 28, Sêrt (Siirt) 5,

Dersîm (Tünceli) 12, Elazîz (Elaziğ) 54, Mûş 13, Mardîn 42, Meletî (Malatya) 95, Riha (Urfa) 83 û Şirnex (Şırnak) 12.
*(avestakurd.net, 04.06.2012)*

**SEROKÊ PARLEMENTÊ PÊŞWAZIYA "BDP"ê DIKE**

***Di 05 Hezîran 2012 de***, serokê parlementa tirkî, Cemil Çiçek, li nivîsgeha (buro) xwe pêşwaziya her du hev-serokên partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye BDPê, Selahettin Demirtaş û Banû Gülten Kışanak, kir. Wan pirsa kurdî, destûra nuh a Tirkiyê û sozên serokwezîrê tirk di dema seredana xwe ya Diyarbekirê de giftûgo (munaqeşe) kirin.
*(netkurd.com, 05.06., aknews.com, 06.06.2012)*

**PKK KESAN DIREVÎNE**

***Di 06 Hezîran 2012 de***, bi şev, HPG 3 kes, ku ji wan serbazek, li ser riya Diyarbekirê revandin. Ev yek piştî rawestandina bi dehan erebe û çavdêrîkirina (kontrol) kesên ku tê de bûn.
*(rudaw.net, 07.06.2012)*

Serokê şaxa Diyarbekirê ya Rêxistina Mafên Mirov li Tirkiyê "IHD", Raci Bilici, konfêranseke çapemeniyê bi bav û meta serbazê ku hat revandin kir û ji PKKê azadkirina van girtiyan xwest.
*(rudaw.net, 08.06.2012)*

***Di 21 Hezîran de***, çekdarên PKKê 5 parêzerên gund (mîlîs) li Buzlupınarê, 20 km nêzîkî Bedlîsê, birîndar kirin û 4 kes, ku ji wan 3 mamoste (ji wan jinek) û mîlîsek, revandin. Roja din, leşkerê tirkî jimareke mezzin ji serbazan (esker) şandin vê navçeyê.
*(netkurd.com, 22.06.2012)*

**RAGIRTINÊN GIRSEYÎ (dûmahîk)**

***Di 07 Hezîran 2012 de***, bi fermana (emr) Dadgeha 3mîn a Cezayên Giran a Wanê, polîsê tirkî şaredarê (serokê belediyê) Wanê, Bekir Kaya, piştî lêgerîneke 3 katjmêran (saet) li mala wî, ragirt. Û wî berpirsiyarên din ên PKKê jî, piştî lêgerînên li malan, ragirtin : serokê şaxa Wanê ya BDPê û şaredar û endamên encumenên şaredariyî yên qezayên Elbak, Bêgirê, Qelqelî, Artemêt, Sixke û Çardêranê, ku girêdayî Wanê ne.

***Di heman rojê de***, li Izmirê polîs hev-serokê berê yê BDPê û parêzer, Cuneyt Canış, ragirt.
*(rudaw.net, rizgari.org, 07.06.2012)*

***Di 10 Hezîran de***, bi şev polîs ket malên cihê li Colemêrg (Hakkari) û Beyazîdê. Bi tevayî 25 kes hatin ragirtin. Ji yên Colemêrgê birêvebirê (mudîr) Meya-Der, Kamil Yaşar; endamên partiya kurdî BDPê, Şükrü Taşma û Hekim Kaya, hebûn. Û ji yên Beyazîdê : nimînendeyên (temsîlcî) Tuhad-Derê, Ahmet Kaya, Fatma Oral û Bişar Ekrem; alîkarê şaredar, Ali Söğüt, û endamên encumena şaredariyî. *(rudaw.net, 11.06.2012)*

***Di 25 Hezîran de***, di çarçeva tevgerên li dijî « KCK »ê (Komela Civaka Dêmokratîk, ku girêdayî PKKê ye), de polîs ket nav buroyên konfêdêrasyona sendîkan, KESK, li Ankara. Bi fermana alîkarê dozkarê (prokuror) komarê li Ankara, lêgerîn li buroyên vê sendîkayê li 20 bajaran, ku ji wan Ankara, Eskişehir, Aydın, Diyarbekir, Colemêrg (Hakkari), Adan û Izmir, hatin kirin û 34 kes, ku ji wan sekreterên giştî yên sendîkayên endamên KESK, SES û TUM-BEL-SEN, hatin ragirtin û birin dadgehê. Piştî 8 katjmêr (saet) jêpirsîn, 22 kes ji wan hatin birin zîndanê. Ew bi *« endambûna rêxistinekê »* hatine bi sûc (mehkûm) kirin. Serokê KESKê, Ismail Tombul, konfêranseke çapemeniyê li ber sendîka kir û tê de got ku hukûmet dixwaze devê her kesekî ku weka wê bîr (fikr) nake bigire û ku ewê têkoşîna sendîka bajo (dewam bike).
*(netkurd.com, 25.06., rudaw.net, aknews.com, 28.06.2012)*

**DADGEHEK PARASTINA BI KURDÎ DIPEJIRÎNE**

Dadgeha Cezayî a Kocaeli xwestina Mehmet Bayraktar, parêzerê (avukat) serokê PKKê Abdullah Öcalan, ku parastina xwe bi zimanê kurdî bike pejirand (qebûl kir). Ew li zîndana Tîp F a Kandira, ji bo kirina propaganda rêxistinekê, ye.
*(netkurd.com, 06.06.2012)*

**SÊ JINÊN PKKÊ LI BRÎTANYA MEZZIN TÊN TAWANBAR KIRIN**

Dadgeheke bajarê Stockê, li Bakurê Brîtanya Mezzin, 3 jinên kurd ên cuhan bi tevayî bi 19 sal û 4 meh zîndan tawanbar kirin, ji bo ku wan xwaringeheke (rêstoran) tirkî yê vî bajarî şewitand û pere bi zorê xwest.

Li gora gotareke rojnama ingilîzî Dail Mailê, ev jin ev in : Delik Dağ (25 salî), Altın Yadırgı (28 salî) û Dilan Eroğlu (20 salî). Wan ev yek ji bo bersîvdayîna kuştina sîvîlan, ku di nav wan de zarok hebûn, li Roboskî, li nêzîkî sînorê iraqî, ji aliyê firokeyên (tayyare) tirkî di meha Çile (janvier) 2012 de, kir ( li bultena me ya Sibatê) binêre. Gotar dibêje jî ku çend roj berê vê şewatê, firokeyên tirkî Kurdistan bombe kiri bû û 34 kes miri bûn. Loma, ev yek hêrsa van sê jinên cuhan bêtir kir.
*(rudaw.net, avestakurd.net, 08.06.2012)*

**BANGA 62 HUNERMENDÊN SÎNEMA YÊN TIRK**

Cara yekemîn li Tirkiyê, 62 hunermendên sînema yên tirk bangek ji hukûmeta tirkî re, ji bo çarekirina pirsa kurdî, wajo (imza) kir. Wan tê de piştgiriya rasthatina serokwezîr Recep Tayyıp Erdoğan bi Kemal Kılıçdaroğlu, serokê partiya tirkî ya dijberiyê (muxalefet) CHPê, li ser vê pirsê re kir.
*(avestakurd.net, 09.06.2012)*



www.arsivakurdi.org

**SEROKÊ TIRK DIÇE GORA EHMEDÊ XANÎ**
Serokê Tirkiyê, Abdullah Gül, çû Beyazîdê û tê de seredana saraya Ishak Paşa kir. Ji wê derê, ew çû gora helbestvanê kurd ê navdar, ê sedsala 17mîn û nivîskarê destana Mem û Zînê, Ehmedê Xanî, û li wira « fatiha » xwend. Ev helbestvan li bal Kurdan weka bavê bîrê (fikr) neteweyî yê kurdî tê dîtin, ji bo ku ew di vê destanê de bangî Kurdan dike ku li dijî dagîrkeran yek bibin.
*(neflel.com, 10.06.2012)*

**AŞKEREKIRINA 500.000 DOSYEYÊN JI 50 SALAN KEVNTIR**
Li gora rojnama tirkî Akşamê, birêvebirê giştî yê ewlehiyê, Mehmet Kılıçlar, ferman da birina 500.000 dosyeyên ku ji 50 sal kevnitir in rêvebiriya giştî ya Arşîvên Dewletê. 250 milyon belge di van dosyeyên ku mêjuya (tarîx) wan berê Çile 1963 ye hene. Ew hemî bi awakî « dîjîtal » hatine kopye kirin. Gelek belge li ser serhildanên kurdî ne.
*(rudaw.net, 11.06.2012)*

**JINEKE SIYASÎ TÊ TAWANBAR KIRIN**
Aysel Tuğluk, parlementera kurd a partiya BDPê û hevseroka KCDê (Komela Civaka Dêmokratîk), ji aliyê dadgeha cezayên giran a Diyarbekirê bi 14 sal û 7 meh zîndan, ji bo propaganda PKKê, hat tawanbar kirin.

Di destpêkê de, ew di 15 dozan (da'wa) de bi tevayî bi 82 sal zîndan hati bû tawanbar kirin. Lê piştre, tawanbarkirinên di 5 dozan de hatin rakirin û jê re 14 sal û 7 meh zîndan man. Ji sedema nedestdayîna (immunité, dokunmazlık) wê ya parlementerî heta 2015, ev tawanbarkirin hîn bi awakî katî (muweqqet) ne hatiye bi cî anîn.
*(rudaw.net, peyamner.com, 12.06.2012)*

**KONFÊRANSEKE ÇAPEMENIYÊ LI SER KOÇBERIYA KURDÎ**
Rêxistina Piştgirî û Alîkariya Koçberên Amedê (Diyarbekir), Amed Göç-Der, Hefteya Koçberiyê pêk anî. Di konfêranseke çapemeniyê de, Vecih Aydoğan, serokê vê rêxistinê, daxuyand ku heta nuha 4.000 gundên kurdî hatin şewitandin û vala kirin û 3 milyon Kurd jê hatin qewirandin. Û wî got jî ku di demên dawîn de gund nema tên şewitandin, lê ku ji sedema avakirina bendavan (baraj) bi deh hezaran Kurd neçar (mecbûr) bûne ku ji ciyên xwe derkevin û ku bitenê ji sedema bendava Ilisu û hundabûna ciyên dîrokî yên nêzîkî kela Hesenkeyfê, 70.000 kes reviyan. Aydoğan got ku ji sedema tevgerên leşkerî li vê navçê û ji gundiyan re qedexekirina çêrandina keriyên xwe li zozanan, ew ditirse ku koçbûn ji nuh de dest pê bike.

Di 30 salên dawîn de, çend milyon Kurd neçar man ku ji malên xwe birevin û li bajarên tirkî, weka Istanbul, Izmir, Mersin, Adana, Aydın … bi cî bibin.
*(rudaw.net, peyamner.com, 14.06.2012)*

**25 SAL ZÎNDAN JI KERR Û LALEKÎ RE !**
Mehmet Tahir Ihsan, barkêşekî (hammal) ku ji roja bûna xwe de kerr û lal e, bi 25 sal zîndan, ji bo avêtina duruşman (slogan) li xwepêşandaneke li Mersinê, di 21 Nîsan 2011 de, hat tawanbar kirin ! Di vê mêjuyê (taxîr) de, ew ji aliyê polîsan hati bû bin çav kirin û dadgehê ew bi *"propaganda ji bo rêxistinekê"* tawanbar kiri bû!
*(netkurd.com, 15.06.2012)*

**SEROKÊ KEVN Ê TIRKIYÊ "ÖZAL" RASTÎ "ÖCALAN" LI KURDISTANA IRAQÊ DIBÛ**
Di hevpeyvîneke (interview) rojnama tirkî Takvim ê de, birêvebirê kevn ê serokê Tirkiyê Turgut Özal, Feyzi Işbaşaran, daxuyand ku Özal, li Kurdistana Iraqê rastî serokê PKKê, Abdullah Öcalan, dihat ji bo dîtina çareyekê ji pirsa kurdî re.
*(rizgari.org, avestakurd.net, 16.06.2012)*

Serok Özal di diyeke kurd bû. Bi fermî, ew ji sedema boraneke (krîz) dil mir. Lê, li gel riswayan (protêsto), tu "otopsî" ne hat aşkere kirin. Gelek kes, jina wî jî ji nav wan, heta nuha bawer in ku ew ji aliyê servîsên dizzî yên dewletê hati bû kuştin, ji bo ku nehêlin ku çareyek ji pirsa kurdî re bê dîtin.
*(Buroya Kurdî)*

**SERHILDANEKE LI ZÎNDANA RIHA (URFA)**
***Di 16 Hezîran 2012 de***, şewatek li şaxa 15C a zîndana Riha (Urfa) bû. 16 girtî mirin û 60 jî birîndar bûn. Ev yek hişt ku serhildaneke girtiyan bibe. Di vê zîndanê de 300 girtî dikarin bimînin, lê jimara wan gihajtiye 1.070. Ji girtiyan, parlementerê partiya kurdî BDPê, Ibrahim Ayhan.
*(netkurd.com, avestakurd.net, 17.06.2012)*

**ŞAREDARÊ WANÊ TÊ DÛR XISTIN**
Wezareta hundir ferman jikarderxistina şaredarê bajarê Wanê, Bekir Kaya da. Ew bi *"alîkarîkirina rêxistinekê"* hatiye tawanbar kirin. Di tevgereke polîsî li malan de, Kaya di 07 Hezîran 2012 de ji aliyê polîs hat ragirtin û piştre birin zîndanê.
*(avestakurd.net, 18.06.2012)*

**SEROKÊ "BDP"ê BANGÎ RAWESTANDINA ŞERR DIKE**
Piştî mirina 8 serbazan û 10 çekdarên PKKê li Colemêrgê (Hakkari) (li bultena me ya buhurî, N° 87, binêre), serokê partiya kurdî BDPê, Selaheddin Demirtaş, li civîneke koma xwe li parlementê peyivî û xwest ku PKK hemî şerrên xwe û hukûmeta tirkî tevgerên xwe yên leşkerî rawestîne. Ev yek ji bo dayîna bextekê (şans) ji çareyeke ramyariyî (siyasî) re.
*(avestakurd.net, 19.06.2012; rizgari.org, 20.06.2012)*

**SEROKÊ KURDISTANA IRAQÊ ŞERRAN TAWANBAR DIKE**
***Di 19 Hezîran 2012 de***, serokê Kurdistana Iraqê, Mesûd Berzanî, daxuyaniyeke nivîskî kir û tê de şerrên li Colemêrgê, ku tê de 8 serbaz (esker) hatin kuştin û

www.arsivakurd.org

16 jî birîndar bûn, tawanbar kirin û bangî çaryeke aşîtiyane ji pirsa kurdî li Tirkiyê re kir.
*(peyamner.com, rudaw.net, netkurd.com, 20.06.2012)*

**SEROKÊ KURDISTANA IRAQÊ Û CÎGIRÊ SEROKÊ TIRK LI TÊLÊVÎZYONÊ**

***Di 20 Hezîran 2012 de***, kanala têlêvîzyona dewletê ku bi zimanê kurdî diweşîne, TRT 6, hevpeyvînek bi serokê Kurdistana Iraqê, Mesûd Berzanî, û cîgirê serokwezîrê tirk, Bülent Arınç, re kir. Berzanî tê de kuştina 8 serbazên ku me li jor gotin tawanbar kir û spasiya serokê tirk Recep Tayyıp Erdoğan, ji bo gavên ku ber bi Kurdên Tirkiyê avêtin, kir.
*(avestakurd.net, rizgari.org, 20.06.2012)*

**BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ**

***Di 19, 20, 23 û 30 Hezîran 2012 de***, leşkerê tirkî navçeyên sînorî yên Kurdistana Iraqê, ji bo lidûketina PKKê, bombe kirin.
*(Çapemeniya Kurdî)*

**SEROKÊ PARTIYA "CHP"ê Û ZIMANÊ KURDÎ**

Serokê partiya dijberiya (muxalefet) tirkî CHPê, Kemal Kılıçdaroğlu, bersîv dan pirsên rojnamevanên kanala têlêvîzyonê CNN Türk û ji wan re got ku ew alîgirê hînkirina zimanê kurdî, lê ne perwerdekirina bi zimanê kurdî (hînkirina hertiştî bi kurdî), ye. Û wî got jî : *"Em welatekî ku gelek zanavên (nasname, identité) wî yên êtnîkî hene ne, lê zanava bilindtrîn tirkî ye. Eger hûn perwerdê bi vî awayî bikin, ewê rê ji perçebûna welat re vebe. Rewşa Beljîka xuya e"*.
*(rudaw.net, 28.06.2012)*

Divê ku meriv zanibe ku Kemal Kılıçdaroğlu Kurdekî elewî ye ! Serokê berê yê vê partiyê, Bülent Ecevit, jî Kurd bû. CHP partiyeke kemalîst û gelek nasyonalîst e. Mixabin, weka li bal hemî gelan, Kurdên assîmîlebûyî yan nîv-assîmîlebûyî ji Tirkan Tirktir in.
*(Buroya Kurdî)*

**RAGIRTINA KUJERÊ NIVÎSKAR MUSA ENTER**

Di 1992 de, nivîskarê kurd ê navdar, Musa Enter, li Şirnexê (Şırnak) hat kuştin. Heta nuha, kujerê wî ne hati bû nas kirin. Lê ***di 29 Hezîran 2012 de***, ew li mala xwe, bi fermana dozkarê (prokuror) komarê yê Diyarbekirê, hat ragirtin. Ew Hamit Yıldırım, parêzerê gund (mîlîsê dewletê yê li dijî PKKê) û « poşamanekî » berê (PKKciyekî berê) ye. Gelek belge li bal wî hatin dîtin.
*(avestakurd.net, 29.06 ; netkurd.com, 30.06.2012)*

# KURDISTANA IRAQÊ

**SEROKWEZÊRÊ KURD LI TIRKIYÊ**

***Di 04 û 05 Hezîran 2012 de***, serokwezîrê Kurdistana Iraqê, Nêçîrvan Berzanî, çû Istanbulê ji bo beşdarbûna Foruma Aborî ya Cihanî. Pê re wezîrê kaniyên sirûştî (tebîî) Dr. Aştî Hewramî, ê planê Dr. Elî Sindî û berpirsiyarê pêwendiyên derve Fellah Mustafa hebûn. Li derveyî vê civîna bilind, ew rastî serokwezîrê tirk Recep Tayyıp Erdoğan, û piştre wezîrê karên derve Ahmet Davutoğlu, hat. Her du alî li ser pêwendiyên dualiyî peyivîn û xurtkirina wan di warên abor (êkonomî) û ênêrjiyê de dilniya (te'kîd) kir. Û wan rewşa Rojhilata Navîn û Iraqê û pêwîstiya çarekirina pirsên (problêm) di navbera herêma Kurdistanê û hukûmeta iraqî de, di çarçeva destûra iraqî de, giftûgo kirin.

Eger em werin pirsa PKKê, Berzanî bi israr got ku pirsa kurdî ne bi çekkan, lê bi awayên aşîtiyane û ramyariyî (siyasî), dikare bê çare kirin.

Li forumê, wezîrê kurd ê kaniyên surûştî, Dr. Aştî Hewramî, daxuyand ku nuha Kurdistana Iraqê di rojê de 350.000 bermîl pêtrol derdixîne, ku di 2015 de ewê karibe di rojê de milyonek bermîl derxîne û di 2019 de ewê di rojê de ev jimar bigihêje 2 milyon bermîl.
*(peyamner.com, 05.06., netkurd.com, avestakurd.net, nefel.com, 06.06.2012)*

**UNAMI LI KURDISTANÊ**

Serokê servîsa pêwendiyên derve yên Kurdistana Iraqê, Fellah Mustafa, civîneke danûstendinên bi nimînendeyên (temsîlcî) hemî sazendeyên (institution) UNAMI (United Nations Assistance Mission) li Iraqê û ajansên din ên UNê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî) ku li navçeyê kar dikin re pêk anî.

Fellah Mustafa got ku ji avakirin û pêşvebirina jêrxaneyê (infrastructure) dûrtir, girîng e ku meriv bîne bîra xwe ku destgehên hukûmetekê, zagon (qanûn) û civaka sîvîl, berê ku ev guheritên ku bêtir xuya dibin bibin, hatin ava kirin.

Serokê buroya herêmî ya UNAMI li Hewlêrê, Sokol Kondi, got ku ew Hukûmeta Herêma Kurdistanê (KRG) weka nimûne (misal) ji bo hemî Iraqê dibîne.
*(peyamner.com, 05.06.2012)*

**EWÊ ÇÊKÎ ÊLÊKTRÎKÊ LI KURDISTANÊ PÊK BÎNE**

***Di 07 Hezîran 2012 de***, bi amadebûna serokwezîrê Kurdistanê, protokolek di navbera Banka Export a Çêk û şirketa kurdî KAR de, li ser avakirina navendeke çêkirina êlêktrîkê bi hêza 1000 mêgawat, hat wajo (imza) kirin.

www.arsivakurd.org

Merasîm bi amadebûna wezîrê pîşesazî (sinaet) û bazarganiyê yê Kurdistanê, balyozê çêk li Iraqê, serokê banka « export » a çêkî, serokê şirketa kurdî KAR, du şirketên tirkî PSG û Renesans, û jimareke wezîr, parêzgar (walî), dîplomat, karsaz « buisnessmen » û nimînendeyên mêdya bû. *(peyamner.com, avestakurd.net, 07.06.2012)*

**KONGREYA KURDÎ-AMERÎKÎ LI SER OLAN**
Enstituya Amerîkî li Hewlêrê, bi hevkariya wezareta ewqafên Kurdistanê, kongreyek li ser biherejiyana olî (dînî) û rola olan di parastina aşîtî û ewlehiyê (emniyet) de pêk anî. Ewê hefteyekê bajo (dewam bike).
*(aknews.com, netkurd.com, 11.06.2012)*

Ev kongre piştî xwepêşandaneke tund (bi şiddet) a cuhanan (li bultena me ya buhurî, N° 86, binêre) bû.
*(Buroya Kurdî)*

**FIRRÎNA YEKEMÎN KURDISTAN-ÎRAN**
***Di 11 Hezîran 2012 de***, firrîna yekemîn a Hewlêr-Tehran dest pê kir. Ew ji aliyê şîrketa firokeyan (tayyare) a îranî, Mahan, tê dabîn (te'mîn) kirin. Birêvebira firokexana (aéroport) navneteweyî ya Hewlêrê, Telar Fayiq, got ku di destpêkê de ewê ev firrîn heftane bin, lê piştre ewê bibin rojane.
*(rudaw.net, aknews.com, 11.06.2012)*

**CARDIN PÊTROL LI KURDISTANÊ**
Şirketa mezzin a norvêjî ya pêtrolê, DNO, pêtrol li nêzîkî Zaxo dît. DNO li Kurdistanê ji 2004 de dixebite û ew yekemîn şîrket e ku li pêtrolê digerre. Buroyeke wê li Hewlêrê heye.
*(netkurd.com, 12.06.2012)*

**ŞANDEKE BRÎTANÎ LI KURDISTANÊ**
***Di 13 Hezîran 2012 de***, serok Mesûd Berzanî pêşwaziya şandeke Encumena Bazarganiyî ya Iraqî-Brîtanî, bi serokatiya Banoress Emma Nicholson, endama Odeya Lordan a brîtanî, kir.

Banû Nicholson got ku pêşveçûna aborî li Kurdistanê vê encumenê han dide (teşwiq dike) ku pêwendiyên xwe pê re xurttir bike. Mîrza Berzanî jê re rewşa erênî (baş, positif) a Kurdistanê, ji aliyê ewlehiyî, ramyariyî, idarî, aborî û bazarganiyî, ravekir.
*(peyamner.com, 13.06.2012)*

**PÊŞANGEHEKE ÎRANÎ LI FWARA NAVNETEWEYÎ YA HEWLÊRÊ**
***Di 13 Hezîran 2012 de***, 7mîn pêşangeha bazarganiyî ya îranî ya 4 rojî li Fwara Navneteweyî ya Hewlêrê, bi amadebûna wezîrê bazarganî û pîşesaziyê yê Kurdistanê Sinan Çelebî, parêzgarê (walî) Hewlêrê Newzad Hadî, parêzgarê Urmiyê (li Kurdistana Îranê), karsazên kurd û mêvanên din, hat vekirin.
165 şîrketên îranî ji 19 parêzgehên Îranê tê de berhem û xizmetên xwe pêşan dan : amûrên (alet) malê, yên pîşesaziyî (sina'î), têknolojîk, barkirin (transport) û berhemên xwarinê.

Fwara Navneteweyî ya Hewlêrê di 2005 de hat ava kirin û heta nuha 40 pêşangehên navneteweyî tê de hatine vekirin.
*(rudaw.net, aknews.com, 13.06.2012)*

**ÊRÎŞÊN TÊRRORÎST LI NAVÇETÊN EREBKIRÎ YÊN KURDISTANÊ**
***Di 13, 14, 17, 19 û 20 Hezîran 2012 de***, êrîşên têrrorîst li Mûsil, Sa'diye, Kerkûk û Celewla bûn. Bi giştî, 9 kes mirin û 38 birîndar bûn.
*(Çapemeniya Kurdî)*

**KONSULXANA FRANSÎ VÎZAYAN DIDE**
Lihevkirinek di navbera hukûmeta Kurdistanê, balyozê Fransa li Iraqê û konsulê fransî li Hewlêrê, Frédéric Tissot, de hat wajo (imza) kirin. Bi vî awayî, ewê konsulxana fransî karibe vîzayan bide kesên ji xelkê Kurdistanê ku bixwazin biçin Fransa.
*Peyamner.com, 14.06.2012)*

**SEREDANA RAWÊJKARÊ CÎGIRÊ SEROKÊ AMERÎKA**
***Di 14 Hezîran 2012 de***, serokê Kurdistanê Mesûd Berzanî pêşwaziya şandeke bilind a amerîkî, bi serokatiya Tony Blinken, rawêjkarê (muşawir) cîgirê serokê amerîkî ji bo karên ewlehiya neteweyî, Joseph Bayden, kir. Her du alî li ser rewşa dawîn a Iraqê, tecrubeyên rastkirina pêvajoya (processus) ramyariyî (siyasî) û desthilatê li Iraqê giftûgo (munaqeşe) kirin.

Mîrza Berzanî bi awakî vekirî got ku sedema vê rewşa nuha li Iraqê nebicîanîna destûra iraqî û lihevkirinên din, ku di navbera partiyên ramyariyî de hati bûn wajo kirin, e. Û wî got jî ku ev yek nayê pejirandin (qebûl kirin) û ku divê ku çareyeke rast bê dîtin.
*(peyamner.com, 14.06., nefel.com, 16.06.2012)*

**KONFÊRANSA ŞÎRKETÊN NAVNETEWEYÎ**
Yek ji kevntirîn şîrketên rawêjkariya (muşawere) karsaziyê (buisness) li Rojhilata Navîn, MEED, ku di 1957 de ava bûye, li Hewlêrê konfêranseke du rojan ji bo şirketên navneteweyî pêk anî. 120 şîrket, ji 10 welatan, beşdarî wê bûn : Bulgaria, Misir, Îran, Iraq, Qeter, Tirkiye, Brîtanya Mezzin, Amerîka, Mîriyên Erebî û Uman.

Banû Newroz Mewlud Emîn, birêvebira giştî ya « Kurdistan Investment Board », bal kişand Zagona Berhemanînê (Investment) li Kurdistanê, yek ji zagonên herî vekirî ji berhemanînên biyanî li Rojhilata Navîn re. Wê ferzendên (firset) berhemanînê di gelek waran de ravekirin (gotin, dan nas kirin). Serokê servîsa pêwendiyên derve, wezîr Fellah Mustafa, li ser pêşveçûna mezzin a Kurdistanê ji 2003 de peyivî û got ku nuha 450 projeyên girîng, ên bi nirxê (qîmet) 20 milyar dolar, zêde bûne.



www.arsivakurd.org

Serokê MEED, Edmund O'Sullivan, got ku ew gelek dilxweş e ku ev konfêrans li Hewlêrê bû û ku gelê kurd, bi saya siyasetên wî yên bi baldan û pragmatîk (pratîk), alaneke ku tê de kirina "buisness"ê, ne tenê li Kurdistanê, lê li tevayiya Iraqê, hêsan e ava kir.
(peyamner.com, 13.06.2012)

## VEKIRINA NIMÎNENDETIYEKÊ LI OTRÎŞÊ

***Di 15 Hezîran 2012 de***, li Vyênna vekirina nimînendetiya (buroya temsîlkirinê) Hukûmeta Kurdistana Iraqê, bi amadebûna berpirsiyarê pêwendiyên derve yê Kurdistanê, Fellah Mutafa, û balyozê Iraqê li Otrîşê (Nêmsa), Sirûd Necîb, bû. Bi vê hincetê (munasebet), cîgirê serokwezîr û wezîrê otrîşî yê karên derve, Dr. Michael Spindeleger, got ku Otrîş dixwaze ku buroyekê li Hewlêrê veke.
(peyamner.com, avestakurd.net, aknews.com, 16.06.2012)

## HUKÛMETA IRAQÎ Û ŞÎRKETA AMERÎKÎ YA PÊTROLÊ "EXXON MOBIL"

Rawêjkarê (muşawir) serokwezîrê iraqî, Elî El-Mûsewî, daxuyand ku di Hezîran 2012 de serokwezîrê iraqî Nûrî El-Malikî nameyek ji serokê amerîkî Barak Obama re nivîsî û tê de jê xwest ku ew nehêle ku şîrketa amerîkî ya pêtrolê Exxon Mobil li Kurdistanê kar bike, ku eger na ewê ev yek bibe kaniya pevçûnê (nexweşî) li Iraqê.
(avestakurd.net, 20.06.2012)

## WEZÎRÊN KARÊN DERVE YÊN SWÊD, BULGARYA Û POLONYA LI KURDISTANÊ



***Di 24 Hezîran 2012 de***, serokê Kurdistana Iraqê, Mesûd Berzanî, bi hev re pêşwaziya wezîrên karên derve yên Swêdê, Karl Bildtk ; Polonya, Radoslaw Sikorski ; û yê Bulgarya, Nikolay Meladenov, kir. Ev yek bi amadebûna serokwezîrê kurd Nêçîrvan Berzanî, cîgirê serokwezîr Imad Ehmed û jimareke wezîrên Kurdistanê. Piştre konfêranseke çapemeniyê ya hevrayî hat kirin.

Mîrza Berzanî ji mêvanên xwe re rewşa Kurdistanê li hemberî borana (krîz) mezzin a iraqî, rewşa li Sûriyê û pêşeroja Rojhilata Navîn aşkere ravekirin. Û wî girîngiya pêwendiyên Kurdistanê bi welatên Yekîtiya Ewropî re dilniya kir. Wî spasya Swêdê, ku deriyên xwe ji penaberên kurd re vakiri bûn û di rewşên zor de alîkariya wan kiri bû, kir.

Şanda ewropî got ku ewê rapporekê li ser seredana xwe ya welatên Rojhilata Navîn amade bike û wê pêşkêşî civîna wezîrên karên derve yên Yekîtiya Ewropî bike.
(peyamner.com, avestakurd.net, nefel.com, 24.06.2012)

## KURDISTAN LI PÎK-NÎKA MEZZIN A HERÊMAN LI POLONYA

***Di destpêka Hezîran 2012 de***, Kurdistana Iraqê beşdar bû 10mîn Pîknîka Mezzin a Herêmên Ewropa û Cihanê « The 10th Great Picnic – Regions of Europe and the World », ku li Pszczyna, li herêma Malopolska, li Başûrê Polonya bû. Ew ji aliyê buroya Nimînendeyê (temsîlcî) Hukûmeta Herêma Kurdistanê li Polonya, Ziyad Reûf, û Navenda Kurdî ji bo Agahdarî û Belgeyan « Kurdish Center for Information and Documentation » (KCID) li Krakovî hati bû temsîl kirin.

Weka herêmên (navçe) din li cihanê, Kurdistan standeke (mase) agahdariyê, li bin koneke ku li ser wê ala kurdî pêl dida, vekir. Bi deh hezaran kes beşdarî vê bûyerê bûn.
(Krg-Polonya, 22.06.2012)

## FILLEYÊN IRAQÊ SPASYA SEROK BERZANÎ DIKIN

Nimînendeyê fermî yê rêxistina ramyariyî (siyasî) ya Kildanî, Suryanî û Asûriyan, Ziya Pêtros, daxuyaniyek weşand û tê de spasiya serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, kir ji bo ku wî mûçeyên (maaş) filleyên ku ji bajarên Başûr û Navenda Iraqê û ji Bexdadê reviyan û pena bûn (iltica) Kurdistana Iraqê dan. Hukûmeta fêdêral li Bexdadê ne xwest ku dayîna mûçeyên wan dewam bike. Û Pêtros spasiya Berzanî ji bo piştgiriya wî ya hergavî ya filleyan kir.
(peyamner.com, rizgari.org, 27.06.2012)

## PÊŞANGEHEKE NAVNETEWEYÎ LI HEWLÊRÊ

***Di 27 Hezîran 2012 de***, fwara navneteweyî ya « furniture » û sarkirina hewa (Fair of furniture and air conditioning) li Hewlêrê dest pê kir. 150 şîrket, ji 10 welatan, beşdarî wê bûn. Ewê 4 roj bajo. Sinan Çelebî, wezîrê pîşesazî û bazarganiyê yê Kurdistana Iraqê ; Newzad Hadî, parêzgarê Hewlêrê, û jimareke karsaz û berhemaniyên biyanî û hundirî beşdarî vekirinê bûn.
(rudaw.net, 28.06.2012)

www.akurd.org

# KURDISTANA ÎRANÊ

**LEŞKER QAÇAXÇIYAN BOMBE DIKE**
Leşkerê îranî bê rawestan sînorên Kurdistana Îranê bombe dike ji bo ku li dû qaçaxçiyan biçe. Di demeke nêzîk de, Kurdek, Ferşed Derbasî, hat kuştin û duduyên din, Muhammed Nûrî û Faysal Derbesî, hatin birîndar kirin.

Li gora ajansa ANFê, di 2012 de ji kêmasî ve 10 kes ji aliyê leşkerê îranî li sînorên Kurdistana Îranê bi Tirkiye û Iraqê re hatin kuştin. Di 9 mehên dawîn ên 2011 de, ji 80 sîvîl bêtir ji aliyê leşkerên îranî û tirkî hatin kuştin û 60 jîn birîndar kirin.

**34 XWENDEKAR TÊN VEGERANDIN KURDISTANA IRAQÊ**
***Di 06 Hezîran 2012 de***, li gora ajansên taxî (mehellî), 34 xwendekar li Zanîngeha Kurdistanê, li Sinê (Sanandaj), li Kurdistana Îranê, hatin vegerandin Kurdistana Iraqê. Ev yek piştî ku ew di katjmêr (saet) 7ê sibê de çend saet hatin ragirtin, piştre bi hogiriya serbazan (esker) birin Başmaxtê, bê ku hûrûmûrên xwe bibin. Yek ji wan, Saman Azîz, daxuyand ku wan li Sinê ji nêzîkî 9 mehan de dixwend û ku wan pereyê hemî masrefên xwe dane. Xwendekarekî din, Huseyn Ahmed, ji mêdyayên taxî re got ku polîs ji wan re bitenê got ku wî fermana ragirtin û sirgûnkirina wan ji wezareta perwerdeya bilind stend.
*(peyamner.com, 07.06.2012)*

**FIROTINA PÊTROLÊ 40% KÊM BÛYE**
***Di 13 Hezîran 2012 de***, li gora BBC, Ajansa Navneteweyî ya Ênêrjiyê (IEA) daxuyand ku ji destpêka 2012 de asta (sewiye) firotina (export) pêtrolê li Îranê 40% nizm bûye. Li gora vê ajansê, Îran di rojê de 3 milyon û 300.000 bermîl pêtrol derdixîne, lê ku dikare jê bitenê 15-25% ji derve re bifiroşe (export), ji sedema ambargoya Amerîka û Ewropa.
*(aknews.com, 13.06.2012)*

**CIVÎNÊN 11 PARÊZGARÊN IRAQ Û ÎRANÊ LI KURDISTANÊ**
***Di 23 û 24 Hezîran 2012 de***, li Kirmanşahê, li Kurdistana Îranê, civîneke fireh di navbera 11 parêzgarên (walî) parêzgehên Urmiye, Sine, Kirmanşah û Ilamê (Kurdistana Îranê), Xuzistan (Başûrê Îranê), Hewlêr û Suleymaniye (Kurdistana Iraqê), Dyala, Wast û Basra (Başrû Iraqê) bû.
*(rudaw.net, 25.06.2012)*

# KURDISTANA SÛRIYÊ

**XWEPÊŞANDAN LI KURDISTANÊ**
***Di 23 û 24 Hezîran 2012 de***, xwepêşandan (meşîn) li bajarên cihê yên Kurdistanê û li taxên kurdî yên Şam û Helebê bûn.
*(Kurdwatch.org, 01.07, 12.06.2012)*

***RAGIRTIN Û KUŞTINA KURDAN***

***Di 09 Gulan 2012 de***, 4 endamên Partiya Yekîtiya Dêmokratîk (PYD, baskê sûrî yê PKKê) li taxa kurdî ya Helebê, Şêx Meqsûd, di dema pevçûnên bi alîgirên rejîma sûrî re de, hatin kuştin.
*(kurdwatch.org, 31.05.2012)*

Serbazê (esker) kurd Muhammed Îdan Birxanî, ji bajarê Serê Kaniyê, ji aliyê servîsên ewlehiyê yên sûrî li nêzîkî Idlibê, li Rojavaya Sûriyê, hat kuştin ji bo ku wî ne xwest ku agir berde dijberan (muxalif).
*(rudaw.net, 06.06.2012)*

Partiya Yekîtiya Dêmokratîk li Sûriyê daxuyand ku Muhammed Reûf Mustafa, berpirsiyarê partiyê li navçeya Efrînê û Çiyayê Kurdan, ji aliyê hêzên ewlehiyê yên sûrî hat ragirtin û ku ew nuha li zîndana navendî ya Helebê ye. Vê partiyê got jî ku Mustafa ji sê salan de ji nexweşiya dil dêşe. *(rudaw.net, 06.06.2012)*
***Di 06 Hezîran de***, Hesen Seîd Xelo, xortekî kurd ku ji gundê Girkê Dijwêr, qezayê Dêrikê, ye, bi şev bi kêr, dema ku wî dergevaniya bexçeyekê li nêzîkî Şamê dikir, hat kuştin.
*(rudaw.net, 07.06.2012)*

Serbazê kurd Hazim Mehmûd Ebbas, ji gundê Girê Reş yê Dêrikê, li nêzîkî Şamê, dema ku wî xizmeta leşkerî dikir, hat kuştin. Malbata wî daxuyand ku ew di 16 Hezîran de bi kuştina wî hat agahdar kirin, bê ku desthilatên sûrî agahdariyan li ser sedem û awayê vê kuştinê bidin wê.

www.arsivakurd.org

Rêxistinên mafên mirov dibêjin ku piraniya serbazên kurd ku napejirînin (qebûl nakin) ku agir berdin xwepêşandiyan ji aliyê serokên xwe bixwe tên kuştin.
(rudaw.net, 14.06.2012)

***Di 23 Hezîran de***, serbazên sûrî ji ciyê xwe agir berda otobuseke ku ji Qamişlî diçû Deyr El-Zorê. Kesek hat kuştin û 8 jî, ku ji wan ajo (şoffor) Abdul-Azîz Huseyn û alîkarê wî Muhammed Barawî, hatin birîndar kirin. Di hefteyên dawîn de, otobusên şîrketên kurdî, ku di navbera Qamişlî û Deyr El-Zorê de diçin, bi rêkûpêk (awakî muntazam) ji aliyê leşker tên êrîş kirin. Du ajo, Barakat Dawûd û Umar Alî, birîndar bûn. (kurdwatch.org, 30.06.2012)

***Di 25 Hezîran de***, du cuhanên kurd, Ezîz Îbîş, xwendekarekî ragihandinê, û Berxwedan Mustafa, xwendekarekî huqûqê, li ber xwaringehekê (rêstoran) hatin revandin. Tukes nizane ew li ku ne.
(avestakurd.net, 26.06.2012)

**PYD LI EFRÎNÊ ÊRÎŞÎ KURDAN DIKE Û WAN DIREVÎNE**

***Di 03 Hezîran 2012 de***, rûniştevanên gundê Basûta, li nêzîkî Efrînê, avakirina bingehên çavdêriyê (kontrol) « checkpoint » ne pejirand (qebûl ne kir). Loma, endamên PYDê dora gund pêça û 7 çalakvanên kurd ên encumenên koordinasyona taxî revandin. Pevçûn derketin û piştre servîsên dizzî piştgiriya PYD kir. Kesek birîndar bû. Dema ku gundiyan pejirand ku van bingehên çavdêriyê ava bikin, ev qurban hatin azad kirin. Di dema avakirinê de, servîsên dizzî amade bûn.
(kurdwatch.org, 11.06.2012)

***Di 07 Hezîran de***, 12 kesên ku berê rojekê li gundê Sînka, li nêzîkî Efrînê, beşdar bûn civîneke dijberiya kurdî "Encumena Neteweyî ya Kurdî" ji aliyê PYDê hatin revandin.
(kurdwatch.org, 11.06.2012)

Li gora nûçeyên ku ji Efrînê hatine, PYDê (baskê sûrî yê PKKê) li vê navçê zilamên çekdar, ku ji navçeyên din ên Kurdistana Sûriyê hatine anîn, bi cî kirine. Ew çavdêriya xaniyan dikin, kesan radigirin û wan dibin ciyên dizzî. PYDê hin malên endamên xwe kirine "dadgeh". Serokê partiya kurdî Azadî, Mustafa Cuma, û berpirsiyarekî vê heman (eynî) partiyê li Almanya, Dr. Welîd Şêxo, hatin tehdîd kirin. Endamekî Encumena Neteweyî ya Kurdî li Sûriyê, Ismaîl Hesen, û endamekî partiya Azadî li Efrînê ji aliyê PYD hatine zîndan kirin.
(avestakurd.net, 08.06.2012)

***Di 15 Hezîran de***, PYDê êrîşî xwepêşandiyên Encumena Neteweyî ya Kurdî li Efrînê kir. 3
kes birîndar bûn. Piştî xwepêşandanê (meşîn), PYDê 3 çalakvanan revandin.
(kurdwatch.org, 21 û 24.06.2012)

***Di 24 Hezîran de***, PYDê li sînorê Kurdistana Iraqê komeke ku Mustafa Cuma, serokê partiya kurdî Azadî, tê de bû ragirt. Cuma roja din hat azad kirin. Ew çû Kurdistana Iraqê û di 27 Hezîran de rastî serok Mesûd Berzanî hat.
(nefel.com, 25.06, avestakurd.net, 25 û 27.06.2012)

***Di 27 Hezîran de***, Dilyar Muhammed li Efrînê ji aliyê PYDê hat revandin. Ev xortê kurd ê 18 salî fîlmeke li ser xwepêşandaneke Cuhanên Efrînê dikişand.
(avestakurd.net, 27.06.2012)

**PYD DADGEHAN VEDIKE**

PYDê "dadgeh" (mehkeme) li çend bajarên Kurdistanê vekirin : Qamişlî, Amûda, Kobanî, Dirbêsiyyê, Dêrik, Efrîn. Li Efrînê, serokê dadgehê Erebekî elewî, Husam Hirkûkî, ye. Li gora çalakvanan, pêwendiyên wî yên gelek xurt bi servîsên dizzî yên sûrî re hene. Endamên din ên vê dadgehê Kurd in : Mustafa Hamsuru, Îso Toto, Umar Berazî û Huseyn Biro.
(kurdwatch.org, 11.06.2012)

**DIJBERIYA KURDÎ BI "PYD"ê RE LIHEVKIRINEK WAJO DIKE**

***Di 11 Hezîran 2012 de***, bi handana (teşwîq) serokê Kurdistana Iraqê, Mesûd Berzanî, Encumena Neteweyî ya Kurdî li Sûriyê bi "Encumena Gel", ku girêdayî PYDê ye, protokoleke hevkariyê wajo (imza) kir. Ev rasthatin li Hewlêrê, li Kurdistana Iraqê, bû. Her du alî li ser 7 xalan li hev hatin : 1- Avakirina encumeneke bilind a her du Encumenan. 2- Encumeneke bicîanînê (tenfîzî) ku ewê çalakiyên hevrayî li navçeyan pêk bîne. 3- Encumenên şaxan li hemî navçeyan. 4- Rawestandina hemî şerrên agahdariyê. 5- Rawestandina hemî çalakiyên çekdarî, li hemî navçeyan. 6- Avakirina encumenên hevrayî yên ne çekdarî yên xweparastinê. 7- Enumenên ji bo çarekirina pirsên (problêm) ku dikarin derkevin û pirsên civakî.

Berpirsiyarekî buroya serokê Kurdistana Iraqê, Hemîd Derbendî, li civînê weka çavdêr amade bû û ev protokol wajo (imza) kir.

Wajokerên Encumena Neteweyî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) Ebdulkerîm Beşşar, serok, û Hemîd Hecî Derwêş û Muhammed Mûsa bûn. Ji aliyê PYDê « Encumena Gel », ev kes amade bûn : Ebdusselam Ehmed, serok, Sînem Muhemmed, Cihan Muhemmed, Muhemmed Reşo û Huseyn Koçer.
(avestakurd.net, nefel.com, 14.06.2012)

**CIVÎNA DIJBERIYA SÛRÎ LI ISTANBULÊ**

***Di 09 Hezîran 2012 de***, Encumena Neteweyî ya Sûrî li Istanbulê, li bin serokatiya Abdulbasit Seyda, Kurdekî ku li Swêdê dijî û ku ciyê Burhan Xelyûn stend, civiya.

Seyda ji Ajansa Anadolu re daxuyanî kirin û bangî serokê sûrî Esed kir ku ciyê xwe ji alîkarê xwe, Farûq El-



www.arsivakurd.org

Şe'ra, re bihêle. Û wî got jî ku pirsa kurdî ya hemî Sûriyê ye û ku ew dikare di çarçeva Sûriyeke dêmokratîk de bê çare kirin. Bi ser de jî, wî got ku Tirkiye piştgiriya şoreşa sûrî dike û bangî vî welatî kir ku derman û xwarin bişîne.
*(netkurd.com, 10 û 12.06.2012)*

**SWÎSRA PERÊ SEROKÊ SÛRÎ DICEMIDÎNE**
Wezîrê swîsrî yê aboriyê daxuyand ku hukûmeta wî 70 milyon frengên swîsrî, ku ji wan 20 milyon ên serokê sûrî Beşşar El-Esed in û yên mayîn ên endamên malbata wî ne, cemidandin.
*(avestakurd.net, 05.06.2012)*

**UN QIRKIRINA ZAROKAN AŞKERE DIKE**
Encumena mafên mirov a UNê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî) rejîma sûrî weka xerabtirîn li cihanê, di warê qirkirina zarokan de, bi nav kir. Li gora rappora rêxistinên mafên mirov, ji destpêka şoreşa sûrî de, 1.200 zarok hatine kuştin. Bi ser de jî, zarok tên êşkence û tecawuza cinsî kirin.
*(avestakurd.net, 12.06.2012)*

**RAPPORA AMNESTY INTERNATIONAL**
***Di 14 Hezîran 2012 de***, Amnesty International rappora xwe li ser Sûriyê weşand. Lêgerên wê seredana 23 bajar û gundan li parêzgehên (wilayet) Heleb û Idlibê, di navbera Nîsan û Gulan 2012 de, kir. Wan hevpeyvîn (interview) bi ji 200 kesan bêtir re, ku ji wan endamên kesên ku hatin kuştin û ku malên wan hatin têk dan (xerab kirin), kirin.

Rawêjkara (şîretkar) Amensty, Donatella Rovera, ji Reuters TV re daxuyand ku wê nimûneyên dubarekirî yên hovîtiyê (wehşiyyet) li dijî sîvîlan dîtin. Wê got ku di her carê de jimareke mezzin ji serbazan bi awakî kurt lê hov diketin nav xaniyan, zilamên cuhan dikuştin û malên wan dişewitandin. Ên ku dihatin ragirtin li zîndanê dihatin êşkence kirin. Û wê got jî ku piraniya van tecawuzan ji aliyê hêzên ewlehiyê yên dewletê û mîlîsên paraleşkerî li dijî gelheya sîvîl dihatin kirin.
*(peyamner.com, 14.06.2012)*

**RAPPORA HUMAN RIGHTS WATCH**
***Di 15 Hezîran 2012 de***, rêxistina amerîkî ya serbixwe ya mafên mirov, Human Rights Watch, daxuyand ku serbaz û mîlîsên çekdar ên alîgirên hukûmetê tecawuz dikin zarokên 12 salî, keç û kurr, jî.

Ev rêxistin dibêje ku wê nemaze li Humsê li 20 tecawuzan di navbera Adar 2011 û Adar 2012 de lêgerîn kiriye.
*(peyamner.com, 15.06.2012)*

www.arsivakurd.org

# NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ LI CIHANÊ

**KURDEK MAMOSTEYÊ “FITNESS”ê YÊ STRANBÊJEKE SWÊDÎ YE**

***Di 26.05.2012 de***, stranbêja swêdî ya navdar, ku xelata Eurovisionê li Bakû, li Azerbaycanê stend, dawuyand ku yek ji sedemên biserketina wê temrînên mamosteyê wê yê “fitness”ê yê kurd, Nebez Qurban, Kurdekî Iraqê ku ji zarokiya xwe de li Swêdê dijî, ne. Ew mamosteyê klubên fitnessê yên swêdî û hollandî û kapîtênê koma tîma football’a cuhanên swêdî ye.
*(rudaw.net, 09.06.2012)*

**MIRINA MUZÎKVANEKÎ KURD Ê CIHÛ LI ISRAÎLÊ**

***Di 04 Hezîran 2012 de***, muzîkvanê kurdê cihû, Nîsan Emran Sûrçî, di temenê (umr) 90 salî de li gundê “Aichpol”ê, yê bajarê Berheva, li Israîlê wefat kir. Riha (esl) wî ji Kurdistana Iraqê, ji gundê Hîza, ya qezayê Bicîlê, navçeya Behdînanê, bû. Wî li amûrên (alet) cihê yên muzîka kurdî dixist.

Weka piraniya Kurdên Cihû, ew ji aliyê rejîma partiya Baasê li Iraqê di 1951 de hat qewirandin Israîlê. Sûrçî berê çend salan goti bû : *“Rast e ku di 1951 de em bicarek ji Kurdistanê hati bûn birrîn, lê tukes nikare vê Kurdistana rengîn, vê Kurdistana girabuha, vê Kurdistana Dicle û Firatê û vê Kurdistana evînê ji dilê me derxîne”*. Li Israîlê, weka gelek Kurdên din, ew bi kurdî dipeyivî, bi awayê kurdî li xwe dikir û dixwar û li amûrên kurdî dixist. Hemî ev tişt beşeke bingehî ya jiyan Kurdên Israîlê ne. *(aknews.com, 05.06.2012)*

**BÎRANÎNA HELBESTVANÊ SEDSALA 16mîn, FEQIYÊ TEYRAN**

***Di 05 Hezîran 2012 de***, festivala çandî û hunerî ya du rojî, ji bo bîranîna Feqiyê Teyran, helbestvanê navdar ê sedsala 16mîn, dest pê kir. Bûyer li Bahçe Sarayê, parêzgeha Wanê, ku helbestvan tê de dijiya, bû. Galêriyeke fotoyan, perçeyên şano (theater), dîlan û xwendina helbestan hatin pêşkêş kirin. Qurdêleyên bi sor, zer û kesk, rengên ala kurdî, tê de pêl dikir. Serokê encumena şaredariyî yê Wanê, Bekir Kaya, û endamên partiya kurdî BDPê beşdarî wê bûn.
*(aknews.com, 06.06.2012)*

**XELATÊN KU LI CIHANÊ JI KURDAN RE HATINE DAYÎN**

***Balyozê Aşîtiyê li Ostralya***



***Di 04 Hezîran 2012 de***, serokê şaxa Ostralya ya Fêdêrasyona Aşîtiya Gerdûnî (Universal Peace Federation), Griek Stone, li Sidney bawernameya (dîplom) Balyozê (sefîr) Aşîtiyê da Ferîd Mexmûrî, nivîskarek ji Kurdistana Iraqê ku li Ostralya dijî. Her sal, ev fêdêrasyon vê xelatê dide çend kesan.
*(rudaw.net, peyamner.com, 06.06.2012)*

***Keçek li Tirkiyê di Takwando de 1mîn e***

Keça cuhan Amedî Ceren Begom li şampyona takwando ji bo kesên 44 kg, li Tirkiyê, 1mîn hat hilbijartin. Berê jî, keçeke din a kurd, Özlem Ulaş, heman (eynî) xelatê stendi bû. Her du jî ji Diyarbekirê ne.
*(rudaw.net, 09.06.2012)*

***Tîmeke futbolê şampyona li Qibrisê destîne***

Li “turnwa”ya VIVA World Cup Kurdistan 2012, tîma Kurdistana Iraqê berra ya Qibrisa Bakur da û bû şampyon.
*(avestakurd.net, netkurd.com, 09.06; rizgari.org, 10.06.2012)*

***Xelata 1mîn ji stranbêj Tatlıses re li Tirkiyê***

Stranbêjê navdar ê kurd Ibrahim Tatlıses Xelata baştirîn stranbêjê muzîka fantêzî li 39mîn Fêstivala Pinpinîka Zêrîn stend. Piştî êrîşeke çekdarî, ew çend meh li nexweşxanê ma bû. Dema ku xelat stend, wî got ku kesên ku ev yek kir bawer dikir ku ewê hunda bibe, lê ku ew weka pinpinîkekê firriya û hat vê festivalê.
*(rudaw.net, 12.06.2012)*

www.arsivakurd.org

***Xelata 1mîn a "bodybuilding" li Îtalya***

Sportîfê kurd Serdar Ismaîl li Venîzê Xelata 1mîn a Fêstivala Navneteweyî ya "bodybuilding" (wabba, bedewbûna laş) stend. Wî nîşaneke zêrîn û qedeha "coupe" şampyonayê stendin. 3 Kurd beşdarî vê şampyonayê bûn. Umer Faysal nîşaneke zêrîn ji bo beşa navîn stend. *(Heftenameya Rûdaw, N° 151, 14.06.2012)*

***Xelata 3mîn a atlêtîsmê li Hollanda***

Li şampyona Ewropa li Hollanda, Kurdekî Tirkiyê, Mehmet Nesim, Xelata 3mîn, nîşaneke ji bronz, stend. Di 2004 de, ji sedema teqîna mînekê (lexm) li navçeya Pasûrê, li nêzîkî Diyarbekirê, wî çavek hunda kiri bû.
*(rudaw.net, 28.06.2012)*

**KONSÊREK LI ÇATAKê, LI TIRKIYÊ**

Koma « Stranên Xuşk » beşdar bû 3mîn Festivala Çatakê û tê de bi çar zimanan, tirkî, kurdî, erebî û ermenî, stira.
*(aknews.com, 11.06.2012)*

**FÎLMEKE BELGEYÎ LI SER ZÎNDANA DIYARBEKIRÊ**

Piştî xebateke dirêj, fîlmçêker Akıf Hasan, fîlmeke belgeyî li ser zîndana Diyarbekirê ya navdar, ku tê de di salên 1980 de (darba leşkerî ya 12.09.1980) bi sedan girtî bi awakî hov (wahşî) hatin êşkence kirin û kuştin, çêkir. Fîlm li Almanya û Kurdistanê hat çêkirin. Kesên ku tê de hati bûn girtin bi awakî vekirî tiştên gelek xerab ku jiyan gotin.
*(avestakurd.net, 14.06.2012)*

**ŞANOYEK JI KURDISTANA TIRKIYÊ LI KURDISTANA IRAQÊ**

***Di 13 Hezîran 2012 de***, cara yekemîn, koma şanoya (théâtre) bajarê Diyarbekirê perçeyek li Suleymaniyê, li Kurdistana Iraqê, pêşkêş kir. Navê wê « Xulamê du mezinan » e. Çêkerê wê, Rukneddin Gün, yek ji 50 navdartirîn li Tirkiyê ye.
Di Gulan 2012 de, hunermendên perçeyên cihê yên Kurdistanê beşdar bû bûn Fêstivala Şanoya Diyarbekirê. Dilşad Huseyn, ji Kurdistana Iraqê, tê de 1mîn hati bû hilbijartin.*(rudaw.net, 25.06.2012)*

**PÊŞANGEHA INGILÎZEKÎ LI KURDISTANA IRAQÊ**

***Di 14 Hezîran 2012 de***, wênekêşê (ressam) brîtanî Ben Hud
son tabloyên xwe li galêriya Ismaîl Xeyat, li Suleymaniyê pêşan dan. Ev berhem sirûştên (tabî'et) Brîtanya Mezzin û Kurdistanê nîşan didin. Hunermend daxuyand ku amanca wî derxistina hestên (sihh) mirovî yên hevrayî (muşterek) li hemberî hemî çandan e.
*(aknews.com, 15.06.2012)*

**FÎLMEKE BELGEYÎ LI BRAZÎLYA**

Fîlma belgeyî « I'm a White Mercenary » (Ez Serbazekî Bi Pere yê Sipî me), ya fîlmçêkerê ji Kurdistana Îranê, Taha Karîmî, li Fêstivala Navneteweyî ya Fîlmê li Brazîlya hat nîşan dan. Ew kuştina 182.000 Kurdên Iraqê di 1988 de, di şerrê Saddam Huseyn yê bi navê « Enfal » de, dibêje. Ev fîlm tevî 65'ên din, ji 3.500 berhemên ji 15 welatan, hat bijartin.
*(aknews.com, 28.06.2012)*

**KONFÊRANSA AKADÊMÎKÊN KURD ÊN YEZÎDÎ LI ALMANYA**

***Di 23 û 24 Hezîran 2012 de***, nêzîkî 200-250 akadêmîsyenên kurd ên yezîdî beşdar bûn konfêransa pêşîn a bi navê « Hevgirtina Akademîkerên Êzdî », li şaredariya Bielefeldê, li Almanya. Gelek konfêrans li ser jiyana civakî ya Yezîdiyan, û nemaze li ser pirsên (problêm) wan li Ewropa, hatin pêşkêş kirin. Carna giftûgoyên (munaqeşe) xurt di navbera guhdaran û konfêranskeran de, weka rola jinê di civaka yezîdî de, cinayetên namûsê, entêgrasyona yezîdiyan di civakên ewropî de û vebûna wan ber bi olên (dîn) din, bûn. Babeta konfêransê ya girîngtirîn bikaranîna zimanê kurdî û dûrketina cuhanan ji kurdîtiyê û ji ola xwe bû.

Li gora rêxistinên yezîdî, li Almanya nêzîkî 60-80.000 yezîdî, ku ji wan 7-10.000 li Bielefeldê, dijîn. Piraniya wan ji Kurdistana Tirkiyê ne, lê di salên dawîn de nêzîkî 3.000 ji Kurdistana Iraqê hatine.
*(rudaw.net, 30.06.2012)*

BRUSSELS HOOFDSTEDELIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPSCOMMISSIE

FÉDÉRATION WALLONIE-BRUXELLES

Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC) û Fédération Wallonie-Bruxelles, bi kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî hatiye weşandin.

www.arsivakurdi.org